



# Leş û Tendirustî



## Şane



Nêzîkî (6000) mîlyon mirovan li cîhanê dijîn. Di nav vê hejmara mezina mirovan da dû mirovên bi tenê jî nînin ku seda sed wekî êk bin. Lê her hemî jî wekî êk dirust biwîne û laşên wan ji heman endam pêk dihên û ew endam - eger di dirust bin- heman erkan bicih dînin. Bo nimone: Gelek reng û şeweyên çavan hene lê her hemî jî - eger di dirust bin - wekî êk dûnyayê dibînin.

## Leş Gelek Karan Diket..



Em bi laşê xwe dixweyn, dilivîn, baz dideyn, baî heldikêşîn, hizrên xwe dikeyn û... htd.


Ji bo ku em van karan bikeyn jî em endamên laşê xwe bi kar dînin wek.. dev, dest, pê, aşik rûvîk, mejî û... htd.

Ev endame hemî ji Şaneyan pêk dihên. Şane wisa di biçûkin ku mirov neşêt wan bi çavan bibînit.

## Biçûktirîn Parçeyên Leşî

Şane wesa di biçukin ku eger bi mîkruskopê nebît mirov neşêt wan bibînit. Lê ewan jîyanê didene laşê me. Ji ber hindê wan jî pêywistî bi xwarinê û oksicînê heye. Şîweyê hemî Şaneyan wekî êk nîne ji ber ku her corek bi rolekî radibît û her corek li dîf cihê wî di laşî da erkekî bicih dînit.







## Aşik



Eger mirov bi mîkruskopê li Aşikî binêrît dê bînît ku ew ji parçeyên cûda cûda pêk dihêt û pêkhata wan parçeyan ne wek êke. Dibêjne wan parçeyan: Şanerist. Şanerist komeka Şaneyane kuavahîyê wan wekî êke û heman erk jî encam diden. Eger em bi mîkruskopê li Aşikî binêrîn dê bînîn her Şaneristek ji bi milyan an Şaneyên hewîrên wek hev pêk dihêt.



**Cin di navka Şaneyê da ne.**



Şaneyên pîstî bi pêkve di niwîsayne û bi vî rengî perjanekî di navbera hundrê leşê me û derve çê diken.



Şaneyên mejî.. Bi davên gelek zirav bi pêkve di grêdayî ne.

### Bo çî em ne wekî êkin?

Şaneyên laşê me ji (cînan) pêk dihên. ew cîn xulk û nîşanan didene me û ji ber kucînen kesê wekî yê dî nînnkes jî wekî kesê nîne.

### Cin kij nîşanan didene me?

Hemî tiştêkê her êk ji me ji êkê dî cûda diket? Wek bejin pirç, rengê çavan û pîstî, şîweyê difinê û....htd.

### Bo çî em bi dayk û bab û xwişk û birayên xwe ve diçin?

Ji ber ku me cînen xwe ji dayk û babên xwe wergirtine.

Babê min    Babê babê min    Bapirê min